IF METALL

# 7 sedemên baş ji bo tevlîbûna IF Metall



# Bê guman divê hûn tevlî bibin!

Ma hûn meraq dikin ku hûn çima beşdarî sendîkayê bibin? Ma ew hêjayî wan sed banqnotan e? Bersiv Herê ye - hûn bi her tiştê ku kollektivavtalet  (peymana kolektîfî) û endametiyê dide we pir zêde li we vedigere. Gava ku gelek ji me yekgirtî bin, hingê em dikarin ew maf û berjewendîyên ku wekî din ji dest me diçin, bernedin, tiştên ku em pir caran pir hêsan hesêb dikin. Gelek sedem hene ku hûn beşdarî IF Metall'ê bibin. Li vir hinek ji yên herî girîng hene:




## A-kassa û sîgorteya hatina

Heger hûn karê xwe winda bikin hûn dikarin ji A-kassa'yê (Sîgorteya bêkariyê) tezmînatê bistînin. Di gel vê yekê, sîgıorteya dahatê ya pêvekî jî li nav vê endamtiyê ye. Hûn dikarin li ser vê babetê bêhtir bixwînin.




# Şert û mercên xweş û mûçeyeke baş

Bi saya peymanên me yên kolektîfî, di nav tiştên din de, hûn meaşeke baş û dadperwer, zêdebûna mûçeyên birêkûpêkî, demjimêrên kar ên maqûl, tazmînata zêde, mûçeya nexweşiyê û kêmkirina demjimêrên xebatê werdigirin. Dema ku we karê xwe qedand, hûn dikarin ji Extra Avtalspensionen.(teqawidiya peymanê ya zêde) sûd werbigirin.




# Şûnewareke xebatê ya ewledar

Şûnewareke baş a xebatê ji bo pêşîlêgirtina li qeza û nexweşiyan girîng e. Em piştrast dikin, ku kardêr li gorî Qanûna Jîngeha Kar tevdigere û nûnerên ewlehiyê ku hene ji bo ewlehî û xweşiya we dixebitin.

## Dema hewce bike alîkarî û piştgirî




Em şîret û piştgiriyê didine we li dema bûyera jikaravêtinê, rehabîlîtasyonê, danûstandina derbareyê mûçe û hêj bêhtir. Gava hewce bike, hûn dikarin alîkariya qanûnî jî bistînin. Em di heman demê de dixebitin da ku hûn bikaribin di rola xwe ya pîşeyî de mezin bibin û hûn bibin xwediyê jêhatîbûnên ku dê di pêşerojê de jî li rewacê bin.




## Hem li ser kar û hem jî di dema vala de tamînatkirî (sîgortekirî) yî

Hûn dikarin bi rêya peymanên me yên kolektîfî û sîgortayên endaman tezmînatê ji bo qezayên li ser kar biqewimin û qezayên li dema we ya vala biqewimin, her wisa  jî gava hûn nexweş bin, bistînin.. Dema hûn di betlaneya dêûbavtiyê de ne, hûn dikarin alîkariyeke zêde jî bistînin.




# Bandora li ser kar

Di gelek mijarên girîng de, berî ku biryar werin girtin, divê kardêr bi me re li IF Metall'ê li cîhê kar muzakere bike. Bo nimûne, ev pirs dikare derbareyê guhertinên demjimêr û erkên şolî be, yan jîderbareyê mûçe çawa were pêşvexistin û dabeşkirin. Wekî endam, hûn dikarin li ser vê yekê bandora xwe bikin.



# Bi hev re em bi hêz in

Daxwazkiria mafê xwe bi tena serê xwe  zehmet e. Lê hûn ne bi tenê ne. Em 300.000 endam in. Em bi hev re dikarin şert û mercên hemû karkerên sinaiyê baştir bikin û edaletê di civakê de zêde bikin.


# Sîgorteya hatinê/dahatê çawa dixebite?

Her kes dikare karê xwe winda bike. Sîgorteya/temînata me ya hatinê A-kassan (kasaya bêkariyê) temam dike, ku gava hûn li karekî nû digerin ewlehiya darayî ya we zêde dibe. Gava hûn nexweş bibin, hûn dikarin bi tevayî, ji sedî 80 ji hatina we* û heta 100 rojan wek tezmînatê bistînin.

Zêdetir bixwînin li **ifmetall.se/inkomstforsakring** yan jî **folksam.se/ifmetall**

**Mînak 1**

Meaşê berî bacê 38,000 kron/heyvê



# Tezmînat wê çiqas be?


Ger hûn zêde qezenc bikin **ji ser** baniya A-Kassan bi alîkariya sîgorteya dahatê, hûn dikarin ji roja 1'ê ta roja 100'an ji sedî 80ê dahata xwe ya tezmînatê* di navbera 33 000 û 50 000 kronî de bistînin.

Heger tu li bin baniya A-Kassan qezenc bikî hûn dikarin ji sedî 80 bistînin ji hatina te ya li ser tezmînatê di navbera 27,500 û 33,000 kronan de - ji roja 101 heta roja 200 (dema ku tezmînata ji A-Kassan kêm dibe).

Di heman demê de derfet heye ku 100 rojên din ên tezmînatê û dahatên ji 50,000 kronî zêdetir sîgorta bikin.

**Mînak 2**

Meaşê berî bacê 31,000 kron/heyvê




* Tezmînata ku ji hêla A-kassan ve li gorî hatina we ya diwanzdeh mehên dawî tê hesibandin


# Modela Swêdê

Ji dawiya sedsala 19"an û vir ve ye ku sendîkayên Swêdê ji bo karker bibin xwedî mûçeyeke baş a û şert û mercên xebatê yên minasib têdikoşin. Li gorî gelek welatên din, sendîkayên swêdî xwedî bandoreke mezin in, bi saya wê yekê ku em bi gelek endaman re baş organîze bûne. Ew me bi hêz dike - ew qas bi hêz ku siyasetmedar ne hewce ne ku pir mudaxeleyî şert û mercên xebata me bikin.

Em bi piranî û her tiştî - ji saeta kar û mûçeyan bigire heya teqawîdan û temînatan - bi kardêran re danûstandinan dikin. Kollektivavtalet.(peymana kolektîf) ev e.

Siyasetmedar li şûna wê dikarin li ser pergalên me yên refahê û hewcedariya me ya perwerdehiyê, ango ew bingeha ku xebatkarên ewledar û jêhatî dafiriîne, bisekinin. Ev bi gelemperî ji vê re Modela Swêdî tê gotin.

Ev model dixwaze ku gelek ji me bibin endamên Sendîka'yê. Dema ku em bi rêkûpêkî rêxistî bin û gelek kes li pişt daxwazên me bin, em dikarin bibin dengek bihêz û peymanên kolektîf ên bihêz bi şert û mercên hêja û mûçeyên baş bi dest bixin.



# Mesrefa wê çi ye?

Xerca endametiyê bi hatina we ve girêdayî ye. Xerca wê bi nêzîkî  li IF Metall ji sedî 1,5'ê dahatê, ku hûn 29,000 kron qezenc dikin mehê 435 kron e. Ji bo heqê endametiyê  heger tu karê xwe winda bikî tu A-kassa û sîgorteya dahatê distînî her weha hemî tiştên din ên bingehîn ên ku di vê broşûrê de hatine rêzkirin.


## Bi vî rengî hûn beşdarî IF Metall'ê dibin




Hêsan e ku mirov bibe endamê IF Metall'ê

Heger we BankID hebe, hûn dikarin bi xwe ji bo endametiyê **serî bidin li: ifmetall.se** .

Heger hûn di karê serîlêdanê de hewceyê alîkariyê bin, bi bi nûnerê Sendîka'yê re li cîhê karê xwe biaxivin an bi beşa xweya herêmî ya IF Metall'ê re têkilî daynin.



IF METALL

IF Metall / 2023-09 / SIB / 30 000 ex.